# DERVEYÊ SEYEHATNAMEYA EVLİYA ÇELEBİ DE EVDAL XANÊ MÎRÊ BİTLÎSÊ

**Sedat ULUGANA**
**Universitaire Sthendal**

**Kurte**

Armanca vê xebatê ew e ku di derbarê Evdal Xanê mîrê Bitlîsê ku sedsala 17. de jiyaye û derbarê lawên wî yên ku piştî wî mîrektiya bitlîsê kirine de , bilî "Seyahatname" Evliya Çelebi, hîn agahiyên nû bide , hin agahiyên xelet ên ku hatine nivîsîn ,hatine gotin rast bike ; di vê çerçovê de tespîtên nû bike û bi nêrîneke zanistî li ser sedemên serhildanên Evdal Xan yên li dijî Osmaniyan bisekine.

**Bêjeyên sereke**: Evdal Xan, Seyahatname, Evliya çelebi, Bitlîs, Osmanî,

**kurtebêje**

h.b. :Heman Berhem

r. :Rûpel

B.O.A.: Başbakanlık Osmanlı arşivi

C.: Cilt

Wer.: werger

Amd.: Amedekar

**1.Destpêk**

**1.1. Heya Dema Evdal Xan Mîrektiya Bitlîsê**

piştî belavbûna ola îslamê Bitlîs yekem car dikev bin desthilatdariya Eyûbiyan. Di van deman de di bajarê bitlîsê de piranî ermen û di çiyayan de jî kurdên Rojkî dijîn. Desthilatdariya Eyûbiyan di sala 1209an de destpê dike û heya sala 1230î berdewam dike. Mirê Bitlîsê di vê dewrê de Melîk Eşref e. Piştî erîşên Xerzemşahan yên ku li deverên dora gola wanê pêk tên, desthilatdariya Eyûbiyan a li ser herêma Bitlîsê dawî dibe.[1] Di sala 1231an de Bitlîs vê carê dikeve dest moxolan.Salekî şûn de Selçûkî erîşê moxolan dikin û wan têk dibin. Bi vî şekli rêveberiya Bitlîsê dikeve dest Selçûkiyan. Di van salên şerên dirêj de Bitlîs ji aliyê van desthilatdariyan ve tê talankirin.Di sedsala 14mîn de ,desthilatdariya Selçûkiyan a li herêma Bitlîsê ewre dibe. Rewşa sîyasî di vê êwrê de li erdnigariya Kurdistanê de aktorên nû derdixe holê. Karakoyûnî û Akkoyûnî ji van aktoran du heb in.[2] di nêzî dawiya sedsala 14mîn de Tîmûr Lenk sefera xwe ya hindistanê diqedîne û berê artêşa xwe dide aliyê Kurdistanê.Di sala 1387an de Bitlîs ji

[1] Osman Turan,*Selçuklular Zamanında Türkiye* , Nakışlar Yayınevi, İstanbul 1984, r. 374.
[2] Orhan kılıç,*XVI. Yüzyılda Adilcevaz ve Ahlat (1530-1605)*,Tamga yayıncılık,Ankara,2000,r.7.

aliyê Tîmûr ve tê dagirkirin.[3] Piştî mirina Mîr Melîk Eşref, birayê wî yê bi navê Mecdedîn ,bi dor law û nebiyên wî yên bi navên İzedîn, Mîr Ebûbekir, Mîr Şêx Şeref (I.) û Mîr zîyadîn hûkum kiribûn.[4] Di dema dagirkirina Tîmûr de mîrê Bitlîsê (II.) Hecî Şeref e. Mîr Hecî Şeref ji Tîmûr re dilsoziya xwe dide nîşan û bi vî şeklî, mîrtiya xwe ya Bitlîsê didomîne. Bilî Bitlîsê çend herêmên devdore jî bi destê Tîmûr ve dikevin bin desthilatdariya Mîrektiya Bitlîsê. Di sala 1421an de Hecî Şeref diçe li ser dilovaniya xwe. Dewsa wî Kurê wî yê bi navê Mîr Şemsedîn (I.) digre. Di dewra Mîr Şemsedîn de , siltanê karakoyîniyan yê firar Kara Yusuf bi alikariya Mîr şemsedîn vedigere herêma Erdîşê. Ji bo alikariyên Mîr Şemsedîn, keça xwe dide Mîr Şemsedîn. Ji ber vê yekê bi destê Mîr Şemsedîn , mîrê Wan û Colemêrgê yê bi navê Mîr Malîk İzedîn jî derbasî aliyê Kara yusuf dibe û li hemberî nebiyê Tîmûr yê bi navê Şah Rûh disekine.Di salên 1450î de Kurdistan dibe qada şerên turkmen û moxolan. Di vê navberê de Mîr Şemsedîn ji vê derfetê îstifade dike û êrîşê Erdîşê dike û Erdîşê tevî mîrektiya Bitlîsê dike.[5] . Piştî ku desthilatdariya turkmenan li deverên dora Gola Wanê sivik an jî li hîn deveran bitemamî holê rabû, Mîr Şemsedîn li ser navê xwe sîke lêda û xutbe da xwendin.van deman de mîrektiya Bitlîsê êdî dewleteke serbixwe ye.[6]Erdîş di sala 1463yan de dîsa dikeve dest Karakoyûniyan û Mîr Şemsedîn ji aliyê Îskender Mîrza ve tê kuştin. Sedema vê kuştinê ne zelal e ku ev yek di “Şerefname”yê de jî derbas dibe.[7] Li ser kuştina Mîr Şemsedîn kurê wî yê bi navê Şeref (III.) dibe mîrê Bitlîsê lê tê gotin ku, ew mirovekî “meczûb” bû û zêde emir nekir. Li peyê xwe lawekî wî yê bi navê Şemsedîn (II.) mabû lê Şemsedîn ji ber ku hê zarok bû nikaribû karên mîrektiyê pêk bîne. Dewsa wî dayika wî ya bi navê Şahim Xatûnê rêveberîtiya mîrektiyê dikir. Demekî şûn de Şahim Xatûn , mirovekî bi navê Ehmed Nesredîn re dizewice. Bi vî şekli yekem car, rêveberitiya mîrektiyê dikeve destê mirovekî ku ne ji nîjada Şerefxaniyan e. Ev yek pir zora konfederasyona eşîrên Rojkayan diçe . Li ser vê yekê di nav mîrektiyê de bêtifaqî çê dibe. Ev hal çend salan berdewam dike. Dema Mîr Şemsedîn mezin dibe, bi alikariya Rojkiyan êrişî Bitlîsê dike. Dayika xwe dikuje lê Ehmed Nasredîn ji Bitlîsê direve û diçe xwe davêje li kela Mîr Evdalê mirê Botan. Li ser hevkirineke pehevguhartî ; mîrê Botan, Ehmed Nasredîn teslîmê Mîr Şemsedîn ( dike. Dawiya desthilatdariya Mîr Şemsedîn de li Bitlîsê de nexweşiya webayê belav

[3] Niyazi Tanılır, Hüseyin Çelik, *Cumhuriyetin 75. Yılında Van*, Ankara 1999, r. 41.

[4] Nazmi Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu anadolu'da Türk Beylikleri*,T.KA.E,Ankara,1982,r.198.

[5] İsmail Aka, “Timur Devri Anadolu'su”, *Osmanlı*, C.I, Ankara ,1999,r.229,233

[6] Gündegül Parlar, “Şerefhanlar'a Ait sikkeler Hakkında Bir Araştırma”, III. Van Gölü Havzası Sempozyumu, T.C. Bitlis Valiliği İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü Kültür Yayınları Nr.17, Ankara, 2007,r.143,144.

[7] Mîr Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, wer. Ziya Avci, Avesta,Stenbol,2007,r.483.

dibe. Ji ber vê nexwaşiyê zaroyên Mîr Şemsedîn jî di tev de bi hezaran mirov dimirin.Peyê wî tenê lawê wî yê bi navê Îbrahîm dimîne.[8] bi dor Mîr îbrahîm (I.), Mîr Hecî Mihemed û Mîr îbrahîm (II.) dibin mîrê Mîrektiya Bitlîsê.Di vê dewrê de Xelat, Mûş û deverên devdorên Mûşê jî di bin desthilatdariya mîrektiya Bitlîsê de nin.Akkoyûnî di nav pirsgirêkên şerên navxweyî de nin, Osmanî jî bi dagirkirina Anatoliyayê û Balkanan ve mijûl in. Ji ber van yekan di Kurdistanê de aramî heye. Lê ev aramî zêde berdewam nake . Akkoyûnî pêşiyê êrişî li ser Bitlîsê dikin. Kela bitlîsê sê salan dorpêç dikin. Egîdiya Mîr Îbrahîm û leşkerên wî heya ji aliyê şairên dijminên wî ve jî tê gotin[9] Di vê navberê de dîsa nexweşiya webayê li Bitlîsê peyda dibe û her du aliyan jî qir dike. Tê gotin ku ji vê nexwaşiyê di Qela Bitlîsê de bi tevahiya Mîr Îbrahîm ve heft kes tenê xilas dibin ku bi vî şeklî Kela Bitlîsê dikeve dest Akkoyûniyan. Bi tevahiya malbata Mîr îbrahîm ve duwazdeh malbatên sereke yên Rojkiyan ji Bitlîsê derdixin û dişînin Azerbaycanê.[10] Di vê êwrê de axayekî bi navê Mihemed Axayê Kelhokî yê derkeve holê ku hewildanên wî yên ji bo berdewamiya desthilatdariya malbata mîrên Bitlîsê bêhempa ne.[11] bi hewildanên Mihemed Axayê Kelhokî ,Mîr Şemsedîn (III.) ê ku ji destê Akkoyûniyan sax filitîbû û çûbû di nav eşîrên Botan de bi cîh bibû ,vedigere Bitlîsê. Li Deşta Bêgiriyê bi Akkoyûniyan re şer dike û jiyana xwe dest dide. Mihemed Axayê Kelhokî vê carê berê xwe dide Azerbaycanê. Pêşiya Mîr Şemsedîn , Kelhokî çûbû Azerbaycanê ku ji (nijadan Şerefxaniyan-Zîyadîniyan ) lawên Mîr îbrahîm yekî bîne Bitlîsê û wî bike mîrê Bitlîsê. Du lawên wî yên bi navên Hesen û Huseyîn anîbû heya Colemêrgê û teslîmê nestûriyan kiribû lê Mîr Êzdînê mîrê Colemêrgê êrîş biribû li ser nestûriyan û ev her du bira jî kuştibûn.Çiqas Şerefxan sedema vê kuştinê wek “serhildana nestûriyan a li hemberî Mîr Êzdîn” bide nîşan jî, li gor fikra min sedema vê kuştinê nexwaziya hebûna mîrêkî kurd ê din a li vê herêmê ye. Ji nijada Mîr Îbrahîm tenê li Azerbaycanê lawekî wî mabû,navê wî jî Mihemed (Mîr Şah Mihemed) bû. Kelhokî wî tîne Bitlîsê û bi alikariya Rojkiyan dike mîrê Bîtlîsê.[12] Mîr Şah Mihemed , li Bitlîsê li ser navê xwe sîke lê dixe û xûtbe dide xwendin.[13]Bîtlîs ku ew bîst û neh salbûn di bin desthilatdariya Akkoyîniyan de bû ,bi vî şeklî carek din “azad” bibû û bîbû dewleteke serbixwe a kurdan. Piştî sê salan Mîr Şah Mihemed diçe li ser dilovaniya xwe. Şûna wî lawê wî yê bi navê Mîr Îbrahîm (III.) dibe

8 Sevgen, h.b.,r.203,204,205
9 Mîr Şerefxanê Bedlîsî, h.b.,r.491
10 Sevgen,h.b.,r.205
11 Bitlisname,“RojkîKahramanıKelhokî”,http://www.bitlisname.com/Haber/rojkan_kahramani_kelhok%3%AE/184/ ,09.05.2014
12 Mîr Şerefxanê Bedlîsî, h.b.,r.494,495,496,497
13 Parlar, h.b.,r.144

mîrê Mîrektiya Bitlîsê. Li vir şûnde di nav malbata Şerefxaniyan de pevçûnên ji bo desthilatdariyê rû didin. Dema Mîr Şah Mihemed vegeriyabû Bitlîsê , lawê Mîr Şemsedîn ê ku li deşta Bargiriyê jiyana xwe dest dabû, yê bi navê Şeref, kiribû rêvebirê Kela Mûşê. Di navbera Mîr Îbrahîm û Şeref de çend caran şer diqewimin. Di encama van şeran de û bi xwestina Mîr îbrahim , Mîr Şeref (IV) dibe mîrê Bîtlîsê.Di dema desthilatdariya Mîr şeref de , milk û xezîneyên Akkoyîniyan dikeve dest mîrektiya (dewleta) Bitlîsê.[14] Di vê êwrê de Safevî îstilaya xwe ya li rojhilat,Osmanî jî îstîlayên xwe yên rojava diqedînin. Êdî ev her du hêzên cîhanî, yên bi baweriya du şîroveyên cûda yên heman olê (Şîa û Sunî) , ji bo armanca "yek hêzbûn a li ser rûyê Cîhanê şerên demdirêj bikin. Qada van şerên demdirêj jî Kurdistan e.Di sala 1507an de dewleta Safeviyan berê xwe dide Kurdistanê û hema bêje tevahiya Kurdistanê dagirber dike. Mîr Şeref di dorpêçkirina çend qelayan de aliyê Şah Îsmaîl dike. Li gor hîn tespîtan Şah Îsmaîl ji malbateke kurd bû.[15] Şah Îsmaîl, bi alikariya Mîr Şeref û mîrên kurd ên din, di herêma Kurdistanê de hebûna tirkmenên Akkoyînî ji holê radike. Êdî di navbera Safeviyên Şîa û Osmaniyên Sunî de mîrektiyên kurdan hene. Ev yek ji bo mîrektiyên kurd derfeteke gring e. Ji ber ku her dû alî jî mecbûrin ku bi mîrektiyan re têkiliya daynin.Armanca Şah Îsmaîl a sereke ew e ku di nav kurdan de mezheba Şiîtiyê belav bike. Lê ev armanc sernakeve. Şah Îsmaîl ji aliyekî ve jî ditirse ku kurd derbasî aliyê Osmaniyan bibin. Şah Îsmaîl di zîyafetekî de, Elî Begê Sasonî û Mîr Şah Mihemedê Şîrvî ne tê de ,mîrên mîrektiyên kurdan ku di nav wan de Mîr Şeref jî hebû ,dil digre.[16] Bi vî şeklî temamê Kurdistanê dixe bin destê xwe. Ev yek ,ji bo kurdistanê ,destpêka bêserxwebûnê ye (1508) . Ku ji vir şûn de mîrên kurd mecbûrin bi van her du hêzên împaratorî re îtîfaqan çê bikin û ji serxwebûna xwe tawîz bidin. Dîsa jî, Mîr Îbrahîmê kurapê Mîr Şeref , li hemberî Safeviyan du salan şer dike û piştî du salan şûn de bi zorê Kela Bitlîsê dikeve dest Safeviyan.

Demekî şûnde ji aliyê rojhilat hêzên Ozbekan peyda dibin û êrîşê dibin li ser Safeviyan. Jixwe ew çend salbû ,li Kurdistanê li hemberî Safeviyan berxwedanên eşîretan hebûn ku wan desthilatdariya waliyên Safeviyan a li ser herêmên Kurdistanê qebûl nedikirin.Ji van eşîretan yek jî Rojkî bûn. [17] Şah Îsmaîl bêçare dimîne û mîrên kurdan berdide lê dîsa jî Mîr Şeref û mîrê Heskêfê Melîk Xelîl bernade.Di vê navberê de dîsa Mihemed Axayê Kelhokî derdikeve holê û bi avayekî , Mîr Şeref ji destê Safeviyan xelas dike.

---

[14] Sevgen ,h.b.,r.211

[15] Faruk Sümer: *Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü-Şah İsmail ile Halefleri,* Selçuklu Tarih ve Medeniyeti Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1976, r. 1

[16] Sevgen, h.b.,r.211

[17] Selahattin Tansel, *Yavuz Sultan Selim*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1969, r. 77

Mîr Şeref û Şêx Emirê Bilbasî êrişê dibin li ser Kela Bitlîsê ,lê sernakevin. Şêx Emirê Bilbasî (kû Şîayan jê re digotin “Qere Yêzîd” ) û kurê wî yê bi navê Elî Axa di vê êrîşa kelê de ji aliyê Safeviyan ve tên kuştin. Li ser vê têkçûyînê Mîr Şeref, mîrên kurdan lihev dicivîne û ji wan li hemberî Safeviyan piştgiriyê dixwaze.Çawa jî ku mîrên piştigiriya Safeviyan dikirin, vedigerin aliyê Mîr Şeref.[18] Ji Karakoyûnî û Akkoyûnîyan heya vê demê , yekem car bû ku mîrên kurdan li hemberî dijminên xwe yekbûneke weha girseyî pêk anîbûn.Piştî yekbûna mîrên kurdan ; Mîr Şeref, bi alikariya Mewlana Îdrisê Bitlîsî ,ji Padîşahê Osmanî Yawuz Sultan Selîm alîkariya şer a li hemberî Safeviyan dixwaze. Bê guman, ev xwestek ji bo Osmaniyan derfeteke zêrîn bû. Di sala 1514an de artêşa Osmaniyan û ya Safeviyan li deşta Ebexê (Çildêran) rastî hev hatin. Nîvê artêşa Osmaniyan ji leşkerên mîrên kurd pêk hatibû. Di qada şer de, Mîr Şeref, mîrê Hîzanê Mîr Dawûd, mîrê Palûyê Cemşîd Beg, mîrê Heskêfê Melîk Xelîl, mîrê Bohtiyan Bekir beg, mîrê Sasonê Mihemed Beg, mîrê Egîlê Qasim Beg, mîrê Zirkan mihemed Beg, mîrê Cizîrê Mîr Şah Elî û lawên Mîr Sarim ên bi navê Silêman Nasir û Qasim Beg li kêleka Mewlana îdrisê Bitlîsî sekinîbûn.[19] Îdrisê Bitlîsî çawa ku behsê dike, di vî şerî de rola leşkerên kurd,teybetî jî rola leşkerên Mîr Şeref pir grînge. Bitlîsî dibêje ku ,lehengiya leşkerên Rojkan û yên mîrên kurd ên din nebûya ,artêşa Osmaniyan yê têk biçûya.[20] Dawiya şer de artêşa Osmaniyan a ku piraniya wê kurd bûn , artêşa Safeviyan têk dibe. Li ser vê têkbirinê Mîr Şeref , berê xwe dide Kela Bitlîsê.Bi alikariya mîrên kurd ên din, kelê ji Safeviyan distîne. Di sala 1514an şûn de êdî mîrê kurd bi Osmaniyan ve têkildar dibin.tiştê ku di vir de bala mirov dikişîne ev e ku , têkiliya Osmaniyan û kurdan bi darê zorê nebûye, “têkildarîyeke bi dilsozî” ye ; û mîmarên vê dilsoziyê jî Mîr Şeref û Îdrisê Bitlîsî ne. Ji vê dîrokê şûn de Bitlîs êdî di qeydên Osmaniyan de derbas dibe.Li gor qeydeke sala 1917an , “Yurtluk-Ocaklık” derbas dibe.[21]

Wezîr Ûlama yê ku waliyê Wanê ye derbasî aliyê Osmaniyan dibe. Peyder pey jî, tevî karên mîrektiya Bitlîsê dibe. Mîr Şeref van destekariyên Ûlama qebûl nake û li ser vê yekê di navbera wan de şer diqewime.Dema ku Osmanî jî aliyê Ûlama dikiin, Mîr Şeref neçar dimîne û derbasî aliyê Şah Tahmasp dibe.Tahmasp, rêveberitiya gelek

[18] Hoca Sadettin, *Tâcü't-Tevârîh,* cilt: II, Matba-i Amire, İstanbul, 1863, r. 300.

[19] Abdullah Demir, “16.Yüzyılda Safevî ve Osmanlı Hâkimiyeti Altında Arşiv Belgeleri Işığında Bitlis Beyleri”, I.Uluslararası Dünden Bugüne Tatvav ve Çevresi Sempozyumu Bildirimi, Beyan Yayınları, Ankara, 2008,r.253,283.

[20] Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi ,Evrak: 8333, Numara: I. II.III.T , Demir,h.b.,r.253,283

[21] Hoca Sadeddin, h.b.,r.300

deveran dide Mîr Şeref û li ser navê wî unvana “xan” zêde dike. Bi vî şeklî di vê demê şûn de Mîr Şeref , êdî bi navê “Mîr Şeref Xan” tê binavkirin.[22] Ev unvana “Xan” dê îro şûn de êdî hema hema yê ji bo hemû mîrên Bitlîsê bên karanîn .Di piştî derbasbûyîna li aliyê Safeviyan a Mîr Şeref Xan , navbera Ûlema û Mîr Şeref Xan de çend şerên din diqewimin. Dawiya şerekî de di sala 1533yan de Mîr Şeref Xan tê kuştin.[23]piştî şerê Çildêranê ,çend sal şûn de Şah Îsmaî û Yawûz Selîm dimirin. Dewsa Şah Îsmaîl , Şah Tahmasp digire. Dewsa Yawûz Selîm jî Qanûnî Sultan Suleyman digire.dijminiyan ebedî jî ji bavan derbasî kuran dibe. Dewsa Mîr Şeref Xan jî lawê wî yê bi navê Şemsedîn (IV) dibe mîr. Lê Osmanî desthilatdariya wî ya li Bitlîsê çiqas di serî de bipejirînin jî paşê fikrê xwe diguherin û desthilatdariya wî napejirînin. Dikin ku wî ji Bitlîsê mişext bikin. Mîr Şemsedîn jî wek bavê xwe îlticayê Şah Tahmasp dike .

## 1.2.Destpêka Nerazîbûyîna Mîrên Bitlîsê Ya Li Hemberî Împaratoriya Osmaniyan

Necîhanîna pêwîstiya peymana ku osmaniyan bi mîrên kurd re darxistibûn, destpêka nerazîbûyîna mîrên Bitlîsê ya dijî Osmaniyan e.

Dema Qanûnî Sultan Suleyman de (1534) ,ji aliyê Osmaniyan ve sefera Îraqeynê pêk tê di vê seferê de mîrên Kurdistanê jî cîh digrin. Di wê demê de Osmaniyan desthilatdariya Mîr Şemsedînê lawê Mîr Şeref Xan hê nas dikirin lê xezîneya Bitlîsê û malên Mîr Şeref Xan, dewrî xezîneya xwe kiribûn. Ev yek bilî Mîr Şemsedîn, zora mîrên kurd ên din jî diçû. Bi rastî heya salên 1530î, di navbera Mîr Şeref Xan û Qanûnî Sultan Suleyman de pirsgirêk çê nebibûn.Li gor dokumaneke arşîva Osmaniyan a sala 1526an , Bitlîs ne di nav eyalet û sancaxên paşayên Osmaniyan de ne.Bîst û heşt mîrektiyên kurdan ku Bitlîs jî tê de ne,(Yurtluk-Ocaklık) xweserî ne.[24] “Yurtluk” , “Ocaklık” pêşiya her tiştî hukûmetên xweserî ne. Di van herêmên ku bin desthilatdariya mîrên kurd de nin, Dewleta Osmanî nikare bacê berhev bike û nikare ji paytextê ,ji bo van herêman “qadî”, “serleşker” hwd. Tayin bike. Desthilatdariya van hereman teqes ji bav derbasî kur dibe ("Eben an Ceddin"). [25] Mîr Şeref Xan, sînorê desthilatdariya xwe fireh kirbû. Colemêrg ,Elbaq jî di vê êwrê de di nav sînorên

22 Mîr Şerefxanê Bedlîsî, h.b.,r.528
23 h.b.,r.532
24 Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi No D.9772 , Demir, h.b.,r.253,282
25 Orhan Kılıç, *XVI.ve XVII. Yüzyılda Van*, Van Belediye Başkanlığı kültür ve Sosyal İşler müdürlüğü yayınları No.6, Van,1997,r.135,136

Mîrektiya Bitlîsê de bû.Şeref Xan her dem êrîşê Safeviyan dikir û bajarên Safeviyan talan dikir. Li gor belgeyeke Farisî, sîxûrên Şeref Xan her dem di derbarê kirinên Safeviyan de ,ji Mîr Şeref Xan re agahî dişandin û wî jî ev agahiyên nû , bi avayekî bilez, ji Sultanê Osmaniyan re dişandin.[26]Di Sefera Îraqeynê de Qanûnî Sultan Suleyman Bexdayê ji Safeviyan distîne. Dema ku vedigere stenbolê di navbera xwe û mîrên kurdan da peymanekî çê dike. Ev peyman him ji bo fehmkirina sînorê desthilatdariya Osmaniyan a di Kurdistanê de û him jî ji bo fehmkirina Pozîsyonên mîrên kurdan ên ku di nav Împaratoriya Osmaniyan de desthilatdarin pir girîng e. Di vê peymanê de “serfiraziyên mîrên kurdan ên di şerên dijî Safeviyan ('Qizilbaşan') ” û “ Îstiqrar û hevalbendiya ku di dema Yawûz Selîm de di navbera mîrên kurd û Osmaniyan de hatibû darxistin” derdikeve pêşiyê. Li gor vê Peymanê Qanûnî emir dike ku ,tu rêvebirê Osmanî tu şeklî mudaxaleyê desthilatdariyên mîrên kurdan nekin.“tahrif”(mudaxale), “tebdil” (guhartin),û “tahvil”(rastkirin,xirabkirin) qethiyen nikare bêkirin di nav van mîrektiyan de. “kalem” nayê leyîstandin.Desthilatdarî her dem ji bav derbasî kur dibe. [27] Lê hê di dema Qanûnî de, Dewleta Osmanî ji vê peymanê tavîz didin û dikin ku Mîr Şemsedîn ji Bîtlîsê mişextî Meletiyê bikin. Çawa me rûpela pêşiyê de jî gotibû, ji ber vê yekê Mîr Şemsedîn wek bavê xwe derbasî aliyê Şah Tahmasp dibe (1535) û şêstheft saliya xwe de wefat dike. Li peyê wî lawên wî yên bi navên Şeref û Xelef dimînin. Şeref, muelîfê “Şerefname”yê ye.[28] Qanûnî Bitlîsê wek “sancaxeke Osmaniyan” bi eyaleta Dîyarbekirê ve girêdide û ev hal ji sala1535an heya sala 1578an berdewam dike.

di van salên bê malbata Şerefxanan a li Bitlîsê, herêmên Kurdistanê dîsa qada şerên Osmaniyan û Safeviyan e. Bê guman di van şeran de zirara herî mezin mîrên kurd dibînin.[29] Osmanî di sala 1548an de Kela Wanê fetih dikin. Piştî vê fetihkirinê sancaxa Bitlîsê piştî sala 1578an bi Wanê ve girêdidin. Şerên Osmaniyan û Safeviyan heya sala 1555an berdewam dike. Di vê salê de di navbera her du îparatoriyan de peymaneke agirbestê tê darxistin.Di van salan de padîşahê Osmaniyan Selîm (II.) e. Di êwra wî de birayê wî yê bi navê Beyazîd îltîcayê Safeviyan dike. Li ser Safeviyan jî ambargoya Osmaniyan heye.Taybetî ,firotan a hesin û barûdê ji bo Safeviyan qedexe ye. Di vê êwrê de ,nameyên ku padîşahê Osmaniyan ji mîrên kurdan re şandine piranî derbarê vê mijarê de nin.[30]

[26] Nazmi Sevgen, “Kürtler” , *Belgelerle Türk Tarihi Dergisi,* Hejmar.8, 1968,r.50,51
[27] Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi , Evrak:11696 ve Demir,h.b.,r.252,283
[28] Sevgen, h.b.,r.223
[29] Demir, h.b.,r.252,283
[30] Kılıç, *XVI.ve XVII. Yüzyılda Van*,r.83

Di sala 1574an de Murad (III.), dewsa Selîm (II.) dibe padîşahê Osmaniyan.Di sala 1578an de gazî Şeref Xan (V) dike ku ew were li ser mîrektiya bav û kalên xwe dîsa bibe mîr.[31] Çawa me gotibû Şeref Xan, muelîfê "Şeref-name" yê ye û lawê Mîr Şemsedîn (IV) e. Şerefxan li Îranê di qesra şah Tahmasp de mezin bibû. Bi zarokên wî re xwendi bû. Di bin destê wî de pirtûkxaneke dewlemend hebû. Bi terbiya polîtîkaya farisan a qedîm terbîye bibû. Li Nahcîvanê rêveberitî kiribû. ev dewlemendiyên wî ,yê derbasî lawên wî û herî zêde jî yê derbasî nebiyê wî yê bi navê Evdal Xan bibe. Piştî gazîkirina Sultan Mûrad, Şeref Xan vedigere Bitlîsê û dibe mîrê Bitlîsê .Di dema mîrtiya wî de Osmanî ,sînorê desthilatdariya xwe heya Azerbaycan û Gurcistanê fireh dikin. Şerefxan di van şeran de artêşa Osmaniyan re dibe alîkar.[32] Tiştên ku wî di dewra xwe de kiriye zaten di Şeref-nameyê de jî nivîsiye.[33]
Di sala 1593yan de Padîşahê Osmanî , temîra Kela Wanê ji Şeref Xan dixwaze.[34] heman xwastek ji mîrên kurd ên li wê herêmê jî hatiye xwestin. Ev xwestek jî li dijî peymana Qanûnî Sultan Suleyman e. Em dê di rûpelên bê de jî bibînin ku ev xwestek yê di navbera Evdal Xan û Osmaniyan de bibe pirsgirêkeke mezin. Di sala 1590î de Sultan Ahmed (I)dibe padîşahê Osmaniyan. Di dema wî de ,Dewleta Osmanî, li dijî Peymana Qanûnî bêtir tevî karên Mîrektiya Bitlîsê dibin.Di Peymana Qanûnî de derbas dibe ku Dewleta Osmanî nikare di hukûmetên mîrektiyên kurdan de karên tahrîrê pêk bîne.Lê di dema Sultan Ahmed de di Mirektiya Bitlîsê de "tahrîr" tê kirin.[35] Dîsa di dewra Şeref Xan de, Dewleta Osmanî, mudaxaleya tayinên ku Şeref Xan di hundurê Mîrektiya Bitlîsê de kirine dikin.Dibêjin ku mafê tayinkirinên di hundurê Bitlîsê, yê Beglerbegiyê Wanê ye.[36]

Çawa ku Şerefxan behsê dike ,wî di sala 1597an de mîrtiya Mîrektiya Bitlîsê dewrî kurê xwe yê bi navê Şemsedîn (V) kiriye.[37] Îhtimal e ku ev mudaxaleyên rast e rast, sedema dest jê berdana mîrtiya Mîrektiya Bitlîsê ya Şeref Xan be. Ev Mudaxaleyên rast e rast, piştî Şerefxan ji bo mîrên Bitlîsê (taybetî ji bo Evdal Xan) yê bibe sedema şerên mezin ên dijî Osmaniyan.

---

31 Başbakanlık Osmanlı Arşivi, 32 Numaralı Mühimme Defteri, hüküm no:276,r.506
32 Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu anadolu'da Türk Beylikleri*, r.227
33 Mîr Şerefxanê Bedlîsî, h.b.,r.545-558
34 B.O.A, 71 Numaralı Mühemme Defteri, hüküm no:256,r 451
35 Orhan kılıç,*730 Numaralı Van,Adilcevaz,,Muş ve Bitlis Livaları Tımar İcmal Defteri*,(Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Basılmış Yüksek Lisans Tezi),Elazığ,1989,r.155-222
36 Bekir Kütükoğlu, "Şeref Han",*İslam Ansiklopedisi*, c.11,İstanbul,1979,r.427
37 Şeref Xanê Bedlisî, h.b.,r.555

## 2 .Êwra Evdal Xan (1618-1664)

### 2.1.Di Derbarê Evdal Xan û Lawên Wî de Hin Şaşitî û Hin Agahiyên Nû

Di nav mîrên Bitlîsê de, yê ku pir hatine ziman, yek Şeref Xan (V) û yek jî Evdal Xan e. Şeref Xan ji ber berhema xwe ya ku di derbarê dîroka kurdan , a bi navê "Şeref-name" yê tê nasîn. Evdal Xan jî ,ji ber "Seyahat-name" ya Evliya Çelebî tê nasîn. Nivîsên ku derbarê van her du mîran de hatine nivîsîn, giştî di çerçoveyên van herdû çavkaniyan de agahiyan didin. Ji ber vê yekê gelek bersîvên pirsên girîng di tariyê de dimînin.

tiştên ku di derbarê Evdal Xan de hatine gotin, yan nîvço ne, yan jî xelet in. Mînak, Nazmi Sevgen dibêje ku Evdal Xan , peyê Şemsedîn  bûye mîrê Bitlîsê.[38] Desthilatdariya Evdal Xan jî ji sala 1638an daye destpê kirin û di sala 1657an de jî daye qedandin. Şakir Epözdemîr jî dibêje ku Evdal Xan lawê Mîr Şemsedîn e.[39].Heman xeletî, di hemû tezên akademîk de jî hatine dubarekirin.[40] Taybetî di nivîs û tezên  di derbarê  Bitlîsê yên mehelî de (ku tê de behsa  Evdal Xan jî tê kirin), Çavkanî  Nazmî Sevgen û Evliya Çelebî ne. Di tez û nivîsên bîyanîyan ên di heman mijarê de jî dîsa çavkanî Evliya çelebî ye.Ev xeletiyên jor de ,bi gelemperî hatine dubarekirin.Ji bilî agahiyên ku  Evliya Çelebî dane, nikarin tiştekî din bibêjin.[41]  Şîroveyên wan ,girêdayê agahiyên Ewliya çelebî ne.

Tiştên ku di derbarê Evdal Xan de hatine nivîsîn , yek jî  di çarçoveya  êrîşa Melek Ahmed Paşa ya ku li dijî Bitlîsê,di sala 1655an de  pêk anîbû de nin.Bêguman Evliya Çelebî vê   êrîşê bi avayekî berfireh dide.Tenê ne şer, di derbarê Evdal Xan de jî agahiyên berfireh dide. Di derbarê vê yekê de du xebat hatinê çêkirin ku ev her dû xebat li ser  sêwiriya beşa Bitlîsê ya vê berhemê rawestiyan e.[42]  li Tirkiyê , Yasemîn Beyazit di derbarê portreya evdal Xan de gotarek amade kiriye ku dîsa çerçove , gotin û agayiyên Evliya Çelebî ne.[43] Haydar Işık , hem berhema Köhler vegerandiye zimanê

38 Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri*, r.228

39 ŞakirEpözdemir,"Yabancı Seyyahlar gözüyle 17.Yüzyılda Kürdistan",Kovarbir, http://www.kovarabir.com/sakir-epozdemir-yabanci-seyyahlar-gozuyle-17-yuzyilda-kurdistan/,18 Îlon 2013

40 Mînak: Zafer Esin, *Osmanlı klasik Döneminde Van Gölü Havzasında Yaşanan Ayaklanma ve Eşkiyalık Hareketleri*, Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Van, 2007 û (Hema bêje hemû tezên ku Tirkiyê hatine amedekirin ên ku tê de navê Evdal Xan derbas dibe.)

41 Mînak: ,Wilhelm Köhler,*Die Kurdenstadt Bitlîs nach dem türkischen Reisewerk des Ewliyâ Tschelebî*. München, dissertation, 1928, Armenak Sakisian, "Abdal Khan, seigneur kurde de Bitlis au XVIIe siècle et ses trésors",*Journal Asiatique*-229, Paris,1937, 252-270, Martin van Bruinessen, "Kurdistan in the 16th and 17th centuries, as reflected in Evliya Çelebi's Seyahatname",*The Journal of Kurdish Studies* 3 2000, 1-11

42 Robert Dankoff, "Evliya Çelebi In Bitlis- The Relevant Section of The Seyahatname Edited With Translation", Commentary and Introduction, Brill, Leiden,1990, Christiane Bulut, "Evliya Çelebis Reise von Bitlis nach Van"  Wiesbaden, Harrassowitz,1997

43 Yasemin Beyazıt, "Evliya Çelebi'nin Sunduğu Önemli Bir Portre: bitlis Hanı Abdal Han" ,Pamukkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi Sayı: 10, Denizli,2011,r.67-82

tirkî û hem ji di derbarê Evdal Xan de romanek nivîsiye ku roman navê xwe ji xewneke ku di berhema Evliya Çelebî de derbas dibe girtiye.[44] Di pêşgotina vê romanê de ku nivîskar bixwe jî tîne zimân , ew di vê romanê de girêdayê gotinên Evliya Çelebî maye. Di Romanek din a dîrokî de ,çiqas mijar rast e rast ne Evdal Xan be jî , Evdal Xan wek lehengekî neyênî, nepak derbas dibe.[45] Dema mirok ku vê romanê dixwîne mirov dibîne ku, bûyer û mijar dîsa di çerçoveya berhema Evliya Çelebî de hatine damezirandin.

Di van hemû berhem, gotar û tezan de hevbeşî ew e ku, taybetî di çerçoveya agahiyên ku Evliya çelebî dane û gotinên ji aliyê Evliya Çelebî ve hatine gotin de hatine amadekirin. Yên ku rêbaza wan agahîdayîn in, xeletî dûbare kirine.

Evdal Xan lawê Mîr Zîyadîn e. Mîr Zîyadîn jî lawê Mîr Şerefxanê muelîfê "Şeref-name"yê ye. Mîr Şemsedîn apê Evdal Xan e. Di kêlikê gora lawê Evdal Xan yê bi navê Bedredîn Beg de ev yek eşkere ye

Ev gor , yê dilşah,şehîd,merhûm,muhtacê rehm û efûkirina Xweda ,ya Bedredîn Xanê kurê Evdal Xanê kurê Zîyadîn kurê Şeref Xan e. sal:1084 (1674) [46]

Di derbarê dîroka dayîkbûna Evdal Xan de agahiyên teqes tinene. Di vê derbarê de tenê texmîn hatine kirin.Yasemin Beyazit dibêje ku Evdal Xan, di navbera salên 1575û 1580î de hatiye dine û 25 saliya xwe de dibe mîrê bitlîsê.[47] Bêguman, Beyazit texmîna xwe hilpesartinê agahiyên Çelebî dike. Lê Çelebî di derbarê emrê Evdal Xan de du agahiyên hevnegirtî dide. Dema behsa bûyerên 1550î dike ,dibêje ku Evdal Xan 70 salî ye.[48] Lê dema ku behsa bûyerên sala 1656an dike, vê carê jî dibêje ku (Evdal Xan bixwe jî dibêje ) ew 80 salî ye.[49] di navbera her dû dîrokan de şeş sal heye.Ferq jî deh sal e.Ger em,gotina Evdal Xan qebûl bikin ; yanî di sala 1656an de 80 salî be ,wê demê di sala

[44] Haydar Işık, *Bitlis Beyi Abdal Han'a Gönderilen Kanlı Ekmek,* Perî Yayınları, İstanbul,2005

[45] Seyit Alp, *Devran, Doz* Basım-Yayın, İstanbul,2000

[46] Sandukaya ku ev nivîs li ser in, li Bitlîsê di hewşa Medreseya İhlasiyeyê de ye ,Kadir Pektaş ,*Bitlis Tarihi Mezarları ve Mezar Taşları,*Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara,2001,r.40,41

[47] Beyazit,h.b.,r.75

[48] Evliya Çelebi, Evliya *Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (4. Kitap),*Amadekar: Yücel Dağlı -Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2001,r.81

[49] Evliya çelebi, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 307 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (5.kitap,1.cilt)* ,Hazırlayan: Yücel Dağlı-İsmet Sezgin-Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2007,r.14

1576an de hatiye dinê.Bi vî şeklî cihê dayikbûyina wî jî ne Bitlîs e, Azerbaycan e. Ji ber ku wê demê, malbata mîrê Bitlîsê li wir dijiya.

Dîroka destpêka mîrtiya Evdal Xan jî dîsa an gorî texmîneke girêdayê gotinên Evliya Çelebî hatiyê nivîsîn.Li gor Beyazit ,Evdal Xan 25 saliya xwe de bûye mîrê Bitlîsê.[50] Ger ku em dîroka dayikbûna Evdal Xan 1576 qebûl bikin, dema ku emrê wî 25 sal be,dîrok 1601 e.Ev yek ne mumkun e ku di navbera Mîr Şemsedîn û Mîr Evdal Xan de , Mîr Zîyadîn heye ku wî nêzî bîst sala mîrtiya Bitlîsê kiriye.Em dizanin ku di sala (hîcrî 1015) 1606an de Mîrê Bitlîsê Mîr Zîyadîn e .

Li vê salê (1015 hicrî) Gonexani êriş bire li ser wan û Adilcewazê. Li wê derê hindek mîrên kurdan daxwazî jê kirin ku bi riya wî Şah Abas bibînin. Di nav wan mîran de Abdulah beg hakimê Xoşab û Zeynel Beg hakimê Qerahîsar û mîrên senceqan, wek Mîr Şeref mîre Cizirê u Zîyadîn kurê Şerefxanê Bedlisî û Zekeriya Xanê Hekarî hebûn. Ew digel Gonexanî çûn û li Nexcîwanê Şah Abas dîtin û Şah Ebas ji wan re rêz girt û xelat pêşkêşî wan kir.[51]

Di sala 1607an de dîsa em Zîyadîn Beg wek mîrê Bitlîsê dibînin. Şah Abas dema ku Şîrvan û Tebrîzê ji Osmaniyan distîne, Mîr Zîyadîn û mîrê Cizîrê Mîr Şeref diçin wî pîroz dikin.[52] Pişti van salan de ji bo demeke kurt mîrtiya mîrektiya Bitlîsê ji Zîyadîn Xan tê standin, ku çawa gerokê îtalyan yê bi navê Pietro Della Valle behsê dike; xanê Bitlîsê ji bo xwestina mafê xwe yê desthilatdariyê, di sala 1616an de tê Stenbolê .Çawa ku Valle dibêje, ji aliyê Sultan Ahmed ve hemû xwestekên xan tên qebûlkirin. Mîrektiya Bitlîsê dîsa dikeve bin destê vî xanî û li ser xwesteka xan, wezîrê Osmanî yê tavanbar jî tê kuştin:

“Ev prens, ji bo dayîna milkên wî yên ji aliyê Nafîz Paşa ve ku jê hatibûn standin û ji bo xwestin tevahiya hemû milkên ku wî dîsa nû ve xistibû bin destê xwe hatibû (...) Xanê Bitlîsê soz da ku yê, ji bo padîşahê ku li hemberî îraniyan re şer dike,12 hezar leşker amade bike ku mesrefên van leşkeran jî yê ji aliyê xanê Bitlîsê ve bên dayîn. Ez bawerim ku ev leşkerên yên sîwarî bin. Ji ber ku di wan sînoran de leşkerên peya kêrî tiştekî nayên (...)”[53]

Em dizanin ku Mîr Zîyadîn heya di sala 1617an de mîrê Bitlîsê ye. Çawa ku İbn-i Nuh behsê dike di vê salê de paşayê Wanê yê bi navêTekeli Mehmed Paşa, leşkerên xwe

---

50 Beyazit,h.b.,r.75

51 İskender Beg Turkmen, Tarih - *i Âlemârâ - yi Abbasî, cild:2*, çap: İrec Afşar, Tehran,1328 (1910) ,r.721

52 İskender Beg Turkmen, h.b., r.753

53 İsmet Şerif Vanlı, *Batılı Eski Seyyahların Gözüyle Kürtler ve Kürdistan*, Avesta, İstanbul,1997,r.23-25

berhev dike û bi tevahiya mîrê Bitlîsê Mîr Zîyadîn û mîrê Hekariyê Yehya Beg ve êrîşê dibe li ser Azerbaycanê.[54] Di nav şer de Mîr Zîyadîn û Yehya Beg, leşkerên xwe ji şer vedikişînin. Ev vekişandin bê xebera Tekeli Mehmed Paşa çê dibe. Tekeli, erîşê dibe li ser leşkerên Yehya Beg. Dawiya pevçûnan de Yehya Beg dîl tê girtin. Mirovê Yehya Beg yê bi navê Ezapşîr, lê dixe Tekeli Mehmed Paşa dikuje.leşkerên Tekeli Mehmed Paşa jî Yehya Beg dikujin.derbarê bûyerên paş ve de ,İskender Beg Turkmen jî agahiyan dide.[55]

li gor fikra min, piştî vê vekişandina Mîr Zîyadîn a qada şer û kuştina Tekeli Mehmed Paşa ya ji aliyê mirovên Yehya Beg ve; Osmanî van her du mîran tavanbar dikin. İhtimaleke mezin e ku piştî sala 1617an dewsa Mîr Zîyadîn, Evdal Xan bûye mîrê Bitlîsê.

Li gor deftera tevcihatê ya sala 1631an ,mîrê Bitlîsê "Evdal Xanê kurê Mîr Zîyadîn" e.[56] Desthilatdariya Evdal Xan heya sala 1656an berdewam dike. Di vê salê çawa ku Evliya Çelebî jî dibêje, Artêşa Osmanî bi hêzeke giran ,erîşê dibe li ser Bitlîsê.dawiyan pêvçûn û şerên demkurt de artêşa Evdal Xan têk diçe û direve li çiyayên Modikan. lê di sala 1656an de Evdal Xan dîsa vedigere Bitlîsê.

Çawa ku Çelebî dibêje Evdal Xan dîsa dibe mîrê Bitlîsê. Di navbera sala 1655 û 1656an (salekî) kurê wî yê bi navê Zîyadîn mîrektiya Bitlîsê dike.Mîrbûyîna Zîyadîn a ji boyî Bitlîsê, bêguman polîtîkayeke taybet a Osmaniyan bû.dayika Zîyadîn keça Zaal Paşayê wezîrê Osmaniyan bû. Evliya Çelebî jî vê xalê rast e rast dîyar dike.[57] Bawerim di vê tayînê de bandora Evliya jî pir e ku di nav hemû lawên Evdal Xan de herî zêde pesnê Zîyadînê nebiyê Osmaniyan dide.

Desthilatdariya Evdal Xan di sala 1657an dîsa destpê dike û heya di sala 1664-1665an berdewam dike.Em vê, ji kîtabeya turbeya Şêx Tahirê Gurgî derdixin ku heman turbe ji aliyê Evdal Xanê Mîrê Bitlîsê ve hatiye çêkirin[58] Gelo piştî talankirina Bitlîsê ya di sala 1655an ,li Bitlîsê çi guherî bû ? Bitlîs di rewşeke çawa de bû? Di sala 1664an de bazirgan û gerokê Fransizî Tavernier, çend rojan li Bitlîsê dimîne. Bihêzbûna mîrê Bitlîsê bala wî dikişîne. Li gor Tavernier, mîrê Bitlîsê pir bihêz e. Tirk mecbûrin ku bi

---

54 İbn-i Nuh, Van *Tarihi*, Fatih Millet Yazma Eserler Kütüphanesi Ali Emiri Tarih Kitapları Koleksiyonu Arşiv Kayıt No:630,İstanbul, r.90, Zeki Tekin, *İbn-i Nuh Van Tarihi-inceleme-Metin*, Ahenk Yayınevi, Van,2003,r.60

55 İskender Beg Turkmen ,h.b. Cilt:3,r.924

56 Mehmet İnbaşı, "XVIII Yüzyılda Bitlis Sancağı ve İdarecileri" , Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi , Hejmar:33, Erzurum,2007,r.249

57 Evliya Çelebi, Evliya *Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (4. Kitap-1.cilt),*Amadekar: Yücel Dağlı -Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2010,r.330

58 Wêne: "Kîtabeya turbeya Şêx Tahirê Gurgî ya ku ji aliyê Evdal Xan ve hatiye çêkirin."

wî re li hemberî “Şah” bi başî derbasiyê bikin. Li gor wî, mîrê Bitlîsê hema bibêje wek padîşahên Osmanî bihêz e û dikare li ber padîşah rabe. Di bin emrê wî de 20-25 hezar suwarî û hinde jî leşkerên peya hene ku ewan piranî “şivan”[59] in û erdnîgariya Bitlîsê jî ji bo mîr hevalbendekî bêhempa ye.[60] Çiqas gotinên Tavernier bifişalbin jî dîsa tê dîtin ku di rewşa Bitlîsê de geşbûyîneke erênî çê bûye.Di nav 9 salan de Evdal Xan dîsa ji aliyê sîyasî û leşkerî ve biserketiye. Lê bêguman talana di sala 1655an ji aliyê abarî û çandî ve ziyaneke bêhempa dabû bitlîsê ku ev zîyan zû zû derbas nedibû.

Di sala 1664an de, Osmanî dîsa bi hêzeke mezin êrîşê dibin li ser Evdal Xan. Waliyê Wanê Emir Yusuf Paşa ye.Begê Xoşabê Ewliya Beg (ku zavayê Evdal Xan e) diçe hewara Bitlîsê.Li hemberî çiyayê Nemrûdê şerekî qewî diqewime. Di vî şerî de kurdên Êzidî jî cîh digirin. Artêşa Osmanî paşve vedikişe lê di heman salê de cara duyemîn erîşê dibin li ser Bitlîsê û Bitlîsê carek din talan dikin.[61] Bawerim piştî vê talanê Evdal Xan heta hetayê ji Bitlîsê dûrdikeve.Wî dil digrin û dibin Stenbolê.Li gor Kohler, Evdal Xan ji aliyê sultanê Osmanî Mehmet (V.) ve di sala 1667 yan jî 1668an de li Stenbolê tê xeniqandin.[62] Kohler ji bo vê îdîaya xwe jî wek çavkanî “Hacı Muhammed Paşa,Zubdei Vakiat” dide nîşan. Bilî navê nivîskar û navê pirtûkê ,di derbarê vê çavkaniyê de tu agahî nade. Dema mirov vê Çavkaniyê dinhêre ,mirov dibîne ku navê nivîskar yê rastîn, “Defterdar Sarı Mehmet Paşa” ye.Navê çavkaniyê jî “Zübde-i Vekayiat” e.[63] Mixabin di vê çavkaniyê de tiştê ku Kohler pêşber kiriye jî tine. Heman îdîa ji aliyê Hammer ve jî ,bi avayekî girtî tê pêşberkirin :

“Mîrê berê yê Bitlîsê Evdal Xan ,ku ji aliyê melek Ahmed Paşa ve hatibû derbekirin û bi aramî û tenê li Stenbolê dijiya, Ji aliyê “gözbekçi”[64] yê seraya sultan ve hat kuştin û serê wî hat jê kirin.Tu gunehê wî tinebû bilî zanîn, şiyan û bikêrhatinê.”[65]

Di derbarê kuştina Evdal Xan de bilî van agahiyan tu agahî vê gavê nîne. Bêguman di rojên pêş de di derbarên wî de bi girêdayê xebatên derbarê heman mijarê de agahiyên

---

59 Bawerim ji peyva “şivan” qesta Tavernier , “eşîrên kurd” in.

60 Jean-Baptiste Tavemier, *Tavernier Seyahatnamesi*, Editor: Stefanos Yerasimos, Wer. Teoman Tunçdoğan, Kitap Yayınevi, İstanbul,2006, r. 289,290.

61 İbn-i Nuh, h.b.,r.106

62 Wilhelm Köhler, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi'nde Kürt Şehri Bitlis,*Werger: Haydar Işık,Perî Yayınları,İstanbul, 2011,r.56

63 Defterdar Sarı Mehmet Paşa ,*Zübde-i Vekayiat*, Amd: Abdülkadir Özcan, Türk Tarih Kurumu Yayınları,Ankara ,1995

64 “Gözbek” ew kesbû ku her dem karên di nav serayê çevdêrî dikir û rapor dida Sultan.

65 Hammer Purgstall, *Tarîxî İmparatorî Osmanî* cild:4, Îhtimam:Giyanfer Cemşîd, wer: Elî Ebadî, Mîrza Zekî, neşr :Asatîr, Tehran ,1387 (1968) ,r.2473

nû û têr û tijeh yên bên dayîn.Wek vî şeklî di derbarê gora Evdal Xan de jî tû agahî tine. Di sala 1682-1683yan de lawê Evdal Xan yê bi navê Huseyîn Beg û lawê Huseyîn Beg yê bi navê Muzafer Beg tên kuştin. Sedema van kuştinan nediyar e.Gorên herduyan li Bitlîsê di Turbeya Şerefiyê de nin.[66]

Çawa ku Evliya Çelebi jî dibêje îhtîmaleke mezin ,lawê Evdal Xan yê bi navê Zîyadîn ji aliyê birayê wî yê binavê Nûrûdehr ve hatibû kuştin. Ji ber vê kuştinê ,birayê kujer jî ji aliyê bav ve yanî ji aliyê Evdal Xan ve hatibû kuştin. Di nav lawên wî yên bi emrê xwe mezin jî tenê Bedredîn mabû. Bedredîn piştî mişextbûna bavê xwe dibe mîrê Bitlîsê.di salên 1665an de ew mîrê Bitlîsê ye.[67] Bedredîn jî wek bavê xwe mîrekî mûqtedîr e lê berbi dawiya emrê wî tê dîtin ku mîrektiya bitlîsê roj bi roj bêhêz dibe.Mîr Bedredî di sala 1674an de diçe li ser dilovaniya xwe.Li di kîtabeya kêlikê wî de peyva "şehîd" heye.Li ser sandûqaya gora wî, nexşên balkêş hene.[68] Di sala 1668-1669an de lawê Evdal Xan yê bi navê Şerefedîn (ji dayikê birayê Zîyadînê helal e û nebiyê Zaal Paşayê Osmanî ye.) dibe mîr. Mîrtiya wî heya sala 1691yan berdewam dike. Piştî wî du salan Muhemed Seîd Xan mîrtiyê dike. Lê 30ê kewçera sala 1693yan de Şerefedîn dîsa dibe mîr. Di heman salê de di navbera wî û Muhemed Seîd Xan de pevçûnên dijwar diqewimin, Şerefedîn mecbûr dimîne û dest ji mîrtiyê dikişîne.[69] piştî sala 1693an desthilatdariya malbata Evdal Xan li Bitlîs qut dibe.mîrên Bitlîsê êdî ji malbatên birayên Şerefxan derdikevin.Lê carek din di 14ê Sibata sala 1744an de lawê Evdal Xan yê ku tenê ew di jiyanê de ne ,di emrekî pir kal de dibe mîrê Bitlîsê.[70] Piştî wî desthilatdariya malbata Evdal Xan li bitlîsê diqede.

## 2.2.Sedemên Şerên Evdal Xan yê Dijî Osmaniyan û Di Dema Wî de Statûya Bitlîsê ya Sîyasî

Tê zanîn ku di çaryeka sedala 17. de de rewşên mîrên kurdan xirab in. Şerên Safevî û Osmaniyan ,erdnigariya Kurdistanê wêran kirine.Mîrektîyên kurdan di bin deynan de nin û kelayên Kurdistanê xirabe ne. Di vê pêvajoyê de bajarê Bexdayê ji derstê Osmaniyan derdikeve û dikeve bin destê Safeviyan (1623). Safevî, piştî destxistina

---

66 Pektaş, h.b.,r.46-47
67 B.O.A, 95 Numaralı Mühimme Defteri, hüküm no:282,r .47
68 Sedat Ulugana ,"Kaderine Terkedilen Kürt Sanatına Özgü Bir Mezarı", Bitlsname,http://www.bitlisname.com/Haber/kaderine_terkedilen_kurt_sanatina_ozgu_bir_mir_mezari/258/ ,18,07,2014
69 Abdullah Demir, "16.y.y. Bitlis Beyleri" ,*Bitlisim,* hejmar:6,İstanbul,Ekim 2012,r.33
70 B.O.A.,Fon:Cevdet -Dahiliye,Gömlek No:16784,Dosya No:336

Bexdayê vê carê çev berdidin Wanê.[71] Artêşa osmanî çendan car Bexdayê dorpêç dikin lê ser nakevin.Osmanî, heyfa têkçûyînên Bexdayê ji mîrên Kurdan hildidin. Wezîrê Osmaniyan yê bi navê Husrev Paşa , serê dehan mîrên kurdan jê dike. Padişahê Osmanî yê vê êwrê Sultan Murad (IV.) e.

Rêveberê Osmanî yê bi navê Ezîz Efendî di vê êwrê de "Islahatname"yeki amade dike û pêşkêşî Sultan Murad dike(1632-1633).Ev islahatmayema ku navê wê "Kanun-name-i Sultani Lil Aziz Efendi" ye ,di beşa xwe ya sêyemîn de tespîtên rewşa mîrên kurdan dihewîne û ji bo heman rewşan çareseriyan pêşniyaz dike.[72] Li gor tespîtên Ezîz Efendî, sedema têkçûyînên artêşên osmaniyan ên li hemberî Safeviyan , xirabbûyina rewşên mîrên kurd in.[73] Li gor Ezîz Efendî kirinên rêvebirên osmanî, aborî û rêvebiriya mîrektiyan xistine rewşeke xetere.Ji ber vê yekê jî bêhêzbûna mîrên kurd, qedera şerên di navbera Osmanî û Safeviyan de diqewimin kifş dike.

Çawa ku me perên jor de jî behsê kiribû ,Sultan Suleyman di navbera xwe û mîrên Kurd de ahîdnameyek amade kiribû û bi zelalî statûya mîrên kurd eşkere kiribû lê tu carî ev ahîdname bi temamî ji aliyê Osmaniyan ve nehatibû bicîh. Ji ber van çevtiyan pirsgirêkên di navber mîrên Kurd û rêvebirên Osmanî bêtir kûr bibûn. Armanca İsilahatnameya Azîz Efendî jî ew bû ku van pirsgirêkan ji holê rake. Ji ber ku Kurdistan "di sînorê Eceman de bendeke bêhempa" bû. Mirov dikare helwesta Evdal Xan a sîyasî ya li hemberî statukoya Osmaniyan di vê Çerçovê de bîne ziman.

Destpêka dijîtiya Osmaniyan a li hemberî Evdal Xan , ji sefera Sultan Mûrad (IV.) a li ser Bexdayê destpê kiribû ku di vê seferê de Evdal Xan cîh negirtibû û piştî wergirtina Bexdayê jî sultan pîroz nekiribû.Ev yek Sultan pir êşandibû . Wezîr Melek Ahmed Paşa jî şahidê vê dilêşandinê bû. Melek Ahmed dema ku Waliyê Dîyarbekirê bû, di sala 1640î de hewl dide ku êrişî bitlîsê bike. Li gor Evliya ,sedem nameyên "nexweş" y3en di navbera Melek û Evdal Xan bûn.[74] Lê di van salan de di navbere kurdên êzdî û Osmaniyan de şerên dijwar diqewim în. Ev şer herî zêde li deşta Ebexê (çaldiran) û Xoşabê rû didan.[75] di sala 1633an êzdiyên Xoşabê êrîşê dibin li ser kela Wanê. Pevçûnên di navbera kurdên êzdî û leşkerên kela Wanê heya sala 1646an berdewam

---

71 Kılıç, *XVI.ve XVII. Yüzyılda Van*, r.132

72 Rêzan Ekinci, "Aziz Efendi'nin Islahatnamesi Üzerine",*Kürt Tarihi,* Hejmar*:*2, 2012,r.14-19

73 Önder Beyter-Rêzan Ekinci, "Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları zamanlarda Yaptıkları Hizmetler",*Kürt Tarihi,* Hejmar*:*2, 2012,r.20-27

74 Evliya Çelebi, Evliya *Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (4. Kitap-1.cilt),* Amadekar: Yücel Dağlı-Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2010,r.92

75 İbn-i Nuh, h.b.,r.96

dikin ku vê salê li Wanê û devdora Wanê erdhejeke mezin çê dibe ku herkes êdî bi halê xwe ve mijûl dibe.1649an de mîrê Mehmûdî Suleyman Beg  dîsa êrîşê dibe li ser kela Wanê.[76] Di encama şerên li devê gola Wanê de leşkerên Mehmûdî sernakevin.Salek şûn de (1650) paşayê Wanê êrîşê dibe li ser Kela Xoşabê. Evdal Xan ji bo alikariya mîrê Xoşabê bike ,bi tevahiya 3 hezar sîwarî ve derdikeve rê lê li deşta Bargiriyê têk diçe.[77] Tê dîtin ku di van hemû êrîşên kurdên êzdî yên li dijî Osmaniyan de Evdal Xan piştgirê wan e. ev yek jî bê gûman ji bîra  Melek Ahmed Paşa naça ku ew di van salan de bi qirkirin û talankirina gundên kurdên êzdî yên li devera çiyayê Sîncarê ve mijûl dibû. Hema bêjin Melek Ahmed Paşa  erkeke   wek erka "Mufetîşekî Ûmûmî" yên sedsala 20an ên li Kurdistanê bicîh dianî. Taybetî peyvira wî "terbiyekirin" a mîr û begên kurdan bû. Li Erzirûm, Dîyarbekir û Wanê yanî çar terefê Evdal Xan peyvira walitiyê bicîh anîbû û Evdal Xan baş nasdikir.Beguman di bingeha seferên leşkerî yên Osmaniyan de  dewlemendiya bajar û deveran jî cîhekî pir girîng digirt ku Bitlîs di vê mijarê de ji bo wan "Xezîne" bû. Evliya Çelebî têr û tijeh di heman  çevkaniyê de behsa dewlemendiya Evdal Xan û Bajarê Bitlîsê dike.[78]   Taybetî di dawiya salên 1630î de Evdal Xan di Kurdistanê de di nav mîrên kûrd ên herî bihêz de bû ku erka parasina sînor ji Safeviyan wî bicîh dianî.[79] Ji ber vê yekê li ser mîrên devdora xwe  ji aliyê leşkerî û sîyasî ve raser bû.Safevî û Osmanî bihev ketibûn û di vê bihevketinbûyînê de kurd bikardianîn.Bawerim Evdal Xan ev yek baş dîtibû ku êdî fermanên Osmaniyan hilnedida nezerê. [80]di sala 1636-1637an de mîrê Muksê yê bi navê Seyîd Xan êrîşê mîrektiya Hîzanê dike. Sultanê Osmanî  ji Evdal Xan dixwaze ku ew mudaxayê vê rewşê bikê û di şer de alikariya mîrê Hîzan bike. Lê Evdal Xan van nameyên Sultan bêbersiv dihêle ku sultan paş ve ji begên Zirkî û  Kirdikan alikariyê ji bo mîrê Hîzan dixwaze.[81] Tiştê balkêş ew e heman sultan di heman demê de dîsa ji Evdal Xan diixwaze ku ew biçe rojhilatê kurdistanê û li hemberî Safeviyan alikariya mîrê Erdelan Mîr Ahmed bike.[82] Evdal Xan jî vê xwesteka sultanê Osmanî tîne cîh.Di vir de  mirov dibîne ku Evdal Xan ,di helwestên xwe de stratejîk tev digere. Di salên 1640î de êdî giliyên Evdal Xan bi riya nameyan ji Sultanê Osmaniyan re dihat kirin. Yanî di van salan de rêvebirên Osmanî yên li Kurdistanê , newêribûn ku bi wî re rast e rast bi wî re

---

76 İbn-i Nuh, h.b.,r.103
77 İbn-i Nuh, h.b.,r.103
78 Evliya Çelebi,*Seyahatname,* (4.kitap,c.1-2010),r.118-180,332-358
79 Kâtip Çelebi (Hacı Halife Mustafa b. Abdullah), *Fezleke-i Kâtip Çelebi*, I-II, İstanbul 1286, r.181-182
80 B.O.A.,86 Nolu Mühimme Defteri,Hüküm No:137,138,,r.42
81 B.O.A.,86 Nolu Mühimme Defteri,Hüküm No:139,r.42
82 B.O.A.,86 Nolu Mühimme Defteri,Hüküm No:94,r.28

şer bikirana[83]

Di navbera mîrên kurdan û dewleta Osmanî de pirsgirêkeke din a herî mezin jî temîirkirina kelayên Osmaniyan ên li Kurdistanên bû. Ji ber vê yekê xwestekên sultanên Osmanî yên ji bo temîrkirina Kela Wanê, her dem di navbera Evdal Xan û Osmaniyan dê pirsgirêkan çê dike.[84] Dema mirov serdema Evdal tîne li ber çavan,mirov dibîne ku çendan car erdhej çê bûne û bi dehan car kelayên wek Kela Wanê hatine talankirin û hilweşandin. Her carê jî Waliyê wanê gazî Evdal Xan dikir ju ew bê û bi tevahiya leşkerên xwe ve kelê temîr bike.li hemberî van xwestekan em helweta wî dizanin ku çawa Evliya Çelebi jî digot ,wî gotiye "Hespê me li Wanê avê venaxwe" [85] Tê zanîn ku ev bersiv bûye pêwîstekeke talankirina Bitlîsê ya ji aliyê Melek Ahmed Paşa ve hatiye kirin.

**3.Encam**

Di dîroka kurdistanê de, bêguman bi sedan rêvebirên ji aliyê sîyasî,aborî û leşkerî ve serkeftî hene ku haya me bi wan çê nebûye. Dijî dîroka fermî ,mirov dibîne ku di sedsala 17mîn de di Kurdistanê mîrên mûqtedîr hene ku wan rengê xwe jî dane dîroka Kurdistanê.Bêguman Evdal Xanê mîrê Bitlîsê ji van mîran e. Osmaniyan di sedsala 17mîn de , tu rê ji bo Evdal Xan nehîştibûn ku ew bi avayekî xweser mîrektiya xwe bi rê ve bibe. Wek mekanên polîtîk ,Wan, Erzirom û Dîyarbekir û wek kesên xwedî erkên fermî Melek Ahmed Paşa û rêvebirên Osmanî yên din havirdora wî girtibûn û hêviya rûxandina wî bûn. Ji ber ku wan kurdistan ji bo "Qizilbaş"an dîwarekî bilind û asê ; mîrên kurdan jî nobedarên vî dîwarî fikirîbûn. Ahîdnameya Qanûnî jî tenê li ser qaxiz bû ku ji bo rêvebirên Osmaniyan pir caran tu hukmên wê tinebûn. Lê Evdal Xan, xwediyê pirtûkxane,îlm,hişmendiya polîtîkaya giştî û medreseyên asrî bû bêguman ev yek qebûl nedikir.Me ew ji portreya ku Evliya Çelebi ku ji me re çêkiribû dinasî lê ew

[83] B.O.A.,90 Numaralı Mühimme Defteri,Hüküm No:266,r.89
[84] B.O.A.,86 Numaralı Mühimme Defteri,Hüküm No:38,r.38
[85] Evliya Çelebi, Evliya *,Seyahatname,* (4.kitap,c.1-2010),r.224

bilî vê portreyê jî pirt tişt bû.Hema mirov dikare bibêje ew di dîroka Kurdistanê de destpêka şikestinekê bû lewma çend sal piştî wî Ehmedê Xanî ew gazindên xwe yên meşhûr dianî ziman.Talankirina Bitlîsê û kuştina Evdal Xan ne tenê talankirina bajarekî û kuştina mîrekî bû, destpêka rûxandina kurdistanê bû. Di sala 1636an de Evdal Xan bi serê xwe sînor ji Safeviyan diparast.Dema di sala 1639an de di Qesra şirîn de Osmanî û Safevî li hev rûniştin û di navbera xwe de peyman çê kirin, êdî wek berê pêdiviya wan li mîrekî wek Evdal Xan nemabû. Pêşiyê Kurdistana qedîm di nav xwe de parve kirin û paşê dest pê kirin ku mîrê kurdan bêhêz bikin an jî ji holê rakin.Serhildanên Evvdal Xan jî di vê çarçoveyê de çê dibûn.

Me Heya îro Evdal Xan tenê di "Seyahatname" ya Evliya Çelebi de dixwand.tiştên ku di derbarên wî de dihatin gotin û nivîsîn her dem pişta xwe didan seyahatnameyê. Ji ber vê yekê xwendin û tahlîên di derbarê Evdal Xan de ji dubarekirinê derbas nedibûn. Me di vê gotarê de bilî Çavkaniya Evliya Çelebi ,ji Çavkaniyên cûr be cûr îstifade kir. Bi vî şeklî di derbarê Evdal Xan û lawên wî de me hîn agahiyên çewt, rast kirin û li agahiyên ku dihatin zanîn jî agahî zêde kirin. Di paşerojê de bêguman dukumanên Osmanî yên arşîvan yên bên xwendin bi vê ve girêdayî ,di derbarê Evdal Xan û serdema wî de tiştên ku nayên zanîn an jî kêm tên zanîn yên bêtir bên zanîn. Di vê mijarê de taybetî , "Ahkam Defteri" û "Muhime Defteri" yên bi zimanê Ossmanî pir girîngin. Bawerim di demên bê de di vê mijarê de xebatên têr û tijeh yên bên kirin.

## Çavkanî


Aka İsmail, “Timur Devri Anadolu'su”, *Osmanlı*, C.I, Ankara ,1999

Alp Seyit, *Devran, Doz* Basım-Yayın, İstanbul,2000

B.O.A.,Fon:Cevdet -Dahiliye,Gömlek No:16784,Dosya No:336

B.O.A, 32 Numaralı Mühimme Defteri

B.O.A, 71 Numaralı Mühemme Defteri

B.O.A.,86 Numaralı Mühimme Defteri

B.O.A.,90 Numaralı Mühimme Defteri

B.O.A, 95 Numaralı Mühimme Defteri

Bitlisname,“RojkîKahramanıKelhokî”,http://www.bitlisname.com/Haber/rojkan_kahramani_kelhok%3%AE/184/ ,09.05.2014

Beyazıt Yasemin, “Evliya Çelebi'nin Sunduğu Önemli Bir Portre: bitlis Hanı Abdal Han” ,Pamukkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi Sayı: 10, Denizli,2011

Beyter Önder Ekinci Rêzan, “Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları zamanlarda Yaptıkları Hizmetler”,*Kürt Tarihi,* Hejmar*:*2, 2012

Bruinessen Martin van, “Kurdistan in the 16th and 17th centuries, as reflected in Evliya Çelebi’s Seyahatname”,*The Journal of Kurdish Studies* 3, 2000

Bulut Christiane, “Evliya Çelebis Reise von Bitlis nach Van” Wiesbaden, Harrassowitz,1997

Dankoff Robert, “Evliya Çelebi In Bitlis- The Relevant Section of The Seyahatname Edited With Translation”, Commentary and Introduction, Brill, Leiden,1990

Defterdar Sarı Mehmet Paşa ,*Zübde-i Vekayiat*, Amd: Abdülkadir Özcan, Türk Tarih Kurumu Yayınları,Ankara ,1995

Demir Abdullah , “16.y.y. Bitlis Beyleri” ,*Bitlisim,* hejmar:6,İstanbul,Ekim 2012

Demir Abdullah , “16.Yüzyılda Safevî ve Osmanlı Hâkimiyeti Altında Arşiv Belgeleri Işığında Bitlis Beyleri”, I.Uluslararası Dünden Bugüne Tatvav ve Çevresi Sempozyumu Bildirimi, Beyan Yayınları, Ankara, 2008

Ekinci Rêzan, “Aziz Efendi'nin Islahatnamesi Üzerine”,*Kürt Tarihi,* Hejmar*:*2, 2012

Epözdemir Şakir “Yabancı Seyyahların gözüyle 17.Yüzyılda Kürdistan”,Kovarbir,http://www.kovarabir.com/sakir-epozdemir-yabanci-seyyahlar-gozuyle-17-yuzyilda-kurdistan/, 18 Îlon2013

Esin Zafer, *Osmanlı klasik Döneminde Van Gölü Havzasında Yaşanan Ayaklanma ve Eşkiyalık Hareketleri*, Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Van, 2007

Evliya çelebi, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 307 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (5.kitap,1.cilt) ,*Hazırlayan: Yücel Dağlı-İsmet Sezgin-Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2007

Evliya Çelebi, Evliya *Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (4. Kitap-1.cilt),*Amadekar: Yücel Dağlı-Seyit Ali Kahraman,Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2010

Evliya Çelebi, Evliya *Çelebi Seyahatnamesi Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu-Dizini (4. Kitap),*Amadekar: Yücel Dağlı -Seyit Ali Kahraman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul,2001

Hoca Sadettin, *Tâcü't-Tevârîh,* cilt: II, Matba-i Amire, İstanbul, 1863

Işık Haydar, *Bitlis Beyi Abdal Han'a Gönderilen Kanlı Ekmek,* Perî Yayınları, İstanbul,2005

İbn-i Nuh, Van *Tarihi*, Fatih Millet Yazma Eserler Kütüphanesi Ali Emiri Tarih Kitapları Koleksiyonu Arşiv Kayıt No:630,İstanbul

İnbaşı Mehmet, "XVIII Yüzyılda Bitlis Sancağı ve İdarecileri" , Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi , Hejmar:33, Erzurum,2007

İskender Beg Turkmen, Tarih - *i Âlemârâ - yi Abbasî, cild:2*, çap: İrec Afşar, Tehran,1328 (1910)

Kâtip Çelebi (Hacı Halife Mustafa b. Abdullah), *Fezleke-i Kâtip Çelebi*, I-II, İstanbul 1286

Kılıç Orhan,*XVI. Yüzyılda Adilcevaz ve Ahlat (1530-1605)*,Tamga yayıncılık,Ankara,2004

Kılıç Orhan,*730 Numaralı Van,Adilcevaz,,Muş ve Bitlis Livaları Tımar İcmal Defteri*,(Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Basılmış Yüksek Lisans Tezi),Elazığ,1989

Kılıç Orhan, *XVI.ve XVII. Yüzyılda Van*, Van Belediye Başkanlığı kültür ve Sosyal İşler müdürlüğü yayınları No.6, Van,1997

Köhler Wilhelm, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi'nde Kürt Şehri Bitlis,*Werger: Haydar Işık,Perî Yayınları,İstanbul, 2011

Köhler Wilhelm,*Die Kurdenstadt Bitlîs nach dem türkischen Reisewerk des Ewliyâ Tschelebî*. München, dissertation, 1928

Kütükoğlu Bekir, "Şeref Han",*İslam Ansiklopedisi*, c.11,İstanbul,1979

Mîr Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, wer. Ziya Avci, Avesta,Stenbol,2007

Gündegül Parlar, "Şerefhanlar'a Ait sikkeler Hakkında Bir Araştırma", III. Van Gölü Havzası Sempozyumu, T.C. Bitlis Valiliği İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü Kültür Yayınları Nr.17, Ankara, 2007

Pektaş Kadir ,*Bitlis Tarihi Mezarları ve Mezar Taşları,*Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara,2001

Purgstall Hammer, *Tarîxî İmparatorî Osmanî* cild:4, Îhtimam:Giyanfer Cemşîd, wer: Elî Ebadî, Mîrza Zekî, neşr :Asatîr, Tehran ,1387 (1968)

Sakisian Armenak, "Abdal Khan, seigneur kurde de Bitlis au XVIIe siècle et ses trésors",*Journal Asiatique*-229, Paris,1937

Sevgen Nazmi, "Kürtler" , *Belgelerle Türk Tarihi Dergisi,* Hejmar.8, 1968

Sevgen Nazmi, *Doğu ve Güneydoğu anadolu'da Türk Beylikleri*,T.KA.E,Ankara,1982

Sümer Faruk: *Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü-Şah İsmail ile Halefleri,* Selçuklu Tarih ve Medeniyeti Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1976

Tanılır Niyazi, Çelik Hüseyin, *Cumhuriyetin 75. Yılında Van*, Ankara 1999

Tansel Selahattin, *Yavuz Sultan Selim*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1969

Tavemier Jean-Baptiste, *Tavernier Seyahatnamesi*, Editor: Stefanos Yerasimos, Wer. Teoman Tunçdoğan, Kitap Yayınevi, İstanbul,2006

Tekin Zeki , *İbn-i Nuh Van Tarihi-inceleme-Metin*, Ahenk Yayınevi, Van,2003

Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi , Evrak:11696

Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi No D.9772

Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi ,Evrak: 8333, Numara: I. II.III.T

Turan Osman,*Selçuklular Zamanında Türkiye* , Nakışlar Yayınevi, İstanbul 1984

Ulugana Sedat ,"Kaderine Terkedilen Kürt Sanatına Özgü Bir Mezarı", Bitlsname,http://www.bitlisname.com/Haber/kaderine_terkedilen_kurt_sanatina_ozgu_bir_mir_meza

Vanlı İsmet Şerif , *Batılı Eski Seyyahların Gözüyle Kürtler ve Kürdistan*, Avesta, İstanbul,1997